NSW GOVERNMENT

What do I need to know if my child gets a formal caution?

Parent/carer information

# Divê ez çi bizanim eger zarokê min hişyarîyeke fermî werdigire?

## Agahiyên dê û bav/çavdêran

### Hişyariya fermî ji bo reftareke xemgîn çi ye?

Reftareke xemgîn tiştek e kesek dike ku dikare bibe sedema zirarê yan xetereyê ji bo xwe yan ji bo kesên din. Hişyariyeke fermî ji xwendekarî re dibêje ku reftara wan bûye sedema zirarêyan nepejrandî ji bo wan û kesên din û zirare li ser xwendin û xwendinkirinê. Ew ji bo we û zarokê hatiye çêkirin ku hûn zanibin reftara wan hewce bi çêtirkirinê heye.

Hişyarîyek fermî nameyek e ku tê de reftarên zarokê we hatî tomar kirin. Zarokê we di vê demê de ji xwendegehê nayê derkirin.

### Dê çi bibe eger zarokê min hişyariyeke fermî bistîne?

Dibistan dê bi we re reftarên bi xem nîqaş bike û hişyariya fermî ji bo zarokê şîrove bike. Midûr dê kopiyeke nivîskî ya hişyariya fermî jî bide we.

Armanca hişyariya fermî ev e ku wextê bidin zarokê we da ku bandora reftara xwe fêm bike û plansaziyeke piştgiriyê bipejirîne. Dibistan dê şansê bide we û zarokê we ku hûn bicivin da ku li ser reftarê nîqaş bikin û piştgirîyên ku ji bo zarokê we hewce ne plan bikin yan jî binirxînin.

Hûn dikarin kesekî piştgirîyê bi xwe re bînin her hevdîtinekê bi dibistanê re.

Hişyariya fermî ji bo nêzî 50 dibistanan haiye bi cih kirin. Di wê demê de, zarokê we dikare bê sekinandin eger ew reftar carekî din çê bibie yan jî ji bo reftarên din yên bi metirsîn.

### Ger zarokê min hişyariyek fermî werbigire ez çi bikim?

Hin caran zarok tiştên li gorî qanênûn xwendegehê yan Qanûna Reftarê ya Xwendekaran nake. Carine, dema ku ev çêdibe, dê hişyariyeke fermî were dayîn. Zêdetir agahdarî li ser çi bikin ger zarokê we li xwendegehê têkeve tengasiyê hene.

Eger hişyariyeke fermî ji zarokê we re hat, ev tê vê wateyê ku reftarek heye ku hewceya bal kişandinê divêt.Têkiliya we ya bi dibistanê re di rêvebirina tevgera zarokê we û pêşxistina çareseriyan de pir girîng e. Li ser hişyariya fermî bi midûrê xwendegehê re bipeyivin û bi tîmê ku piştgiriya zarokê dike re kar bikin da ku hin çareseriyan peyda bikin.

### Heke reftar dîsa çêbibe?

Ger reftarên xemgîn di nav 50 rojên xwendegehê de piştî hişyariya fermî ya bingehîn dîsa çêbibe, dibe ku midûr biryarê bide ku zarokê we bide derkirin. Biryara derkirina zarokî dê tenê piştî ku midûr li reftar, û hewcedariyên kesane yên zarokê we û zarokên din binêre. Agahiyên li ser rawestandina xwendekar hene.

### Ger hîn xemên min hebin ez çi bikim?

Ger xemên we li ser fêrbûn, reftar yan başbûna zarokê we li xwendegehê hebin, çêtirîn tişt ku hûn bi mamoste, alîkarê midûr yan cîgirê midûr re biaxafin. Pir pirsgirêk dikarin bi axaftina bi kesên ku zarokê we û rewşê nas dikin re çareser bibin.

Carine dibe ku hewceya we bi axafitina bi kesekî din re hebe. Xwendegeha we dikare agahdariya pêwendiyê ji bo nivîsgeha perwerdehiya we ya herêmî ya ku dibe alîkariyê bide we. Di heman demê de bifikirin ku hûn bi doktorê zarokê xwe re bipeyivin heke hûn difikirin ku xemên we sedemên bijîjkî hene.

Ji bo agahiyên zêdetir li ser parêzvaniya zarokê we hene, û hem jî Peymana Civaka Xwendegehan rêyên danûstendina bi dibistanan re diyar dike.

### Ez dikarim çi agahîyan ji dibistanê bigirim?

Hun dikarin agahîyên zêdetir ji dibistanê bixwazin bê ka çi bûye û çima. Divê dibistan ji we re şîrove bike bê ka sedemên biyarên wan çi ni eger arîşeyeka we hebe divê sedema biryarên wan çi ne û dê çi çalakî yan jî çi bikin eger pirsgirêkeka we hebe.

### Xizmeta wergerandina telefonî

Heke hûn dixwazin bi xwendegehê re têkiliyê daynin û ji bo Îngilîzî hewcedariya we bi alîkariyê heye, ji kerema xwe telefone xizmeta wergêriyê 131 450 bikin, ji wan re bêjin hûn çi zimanî diaxafin û ji operator bixwazin ku telefone xwendegehê bike. Operator dê wergêr li ser xetê peyda bike da ku alîkariya we bike. Ev xizmet bê pereye.